RÊVEBERIYA ZAROK- Û PERWERDEHIYÊ

2017-10-30

Skolplatsen

Skolplatsen sîstema qeydkirina zarok- û xwendekaran a Şaredariya Bollnäs'ê ye.

Bi rêya e-xizmetên Skolplatsen'ê, hûn wek xudan dikarin wan tiştan bikin:

- Ragihînin ku zarokê we nexweş e
- Serlêdana cihekê bikin - Dibistana pîşeyî
- Serlêdana/betalkirina cihekê bikin - Pêşdibistan
- Serlêdana/betalkirina cihekê bikin - Navenda piştî-dibistanê
- Serlêdana Dibistana Çandî bikin

E-nasname

Ji bo têkevin Skolplatsen'ê, ji we re e-nasname/JimareyaBanqê pêwîst dike. Li vir derbarê e-nasname bêtir bixwînin

Têketin

Hûn dikarin bi rêya telefona jîr, tablet an jî kompîtirê têkevin Skolplatsen'ê, bi serlêdana navnîşana https://bollnas.skolplatsen.se

Ragihandina nehatin/nexweşbûnê

Eger zarokê we nexweş be, an jî ji ber sedemeke din nehatibe, divê ev yek bi rêya Skolplatsen'ê bê raportkirin. JI KEREMA XWE! Raport divê beriya12:00'ê nîvroyê bê çêkirin.

Xudanên ku xebatkarên Şaredariyê ne nikarin bi rêya hesabê xwe yê Şaredariyê têkevinê.

Agahiyên xudan ên peywendiyê

Ji bo ku danûstandina bi e-maîl/peyama nivîskî ya Skolplatsen'ê bixebite, divê hûn agahiyên xwe yên peywendiyê bidin dema ku hûn têketinê. Hûn dikarin vê yekê di Skolplatsen de li jêr bijartekên menu "Agahiyê peywendiyê yên din" û "Sazkirin" pêk bînin.

BOLLNÄS KOMMUN